

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

zarokxana kurda  
ya yekem li ewrûpa



## NAVEROK

|                          |    |
|--------------------------|----|
| Şovenistên Tirkên .....  | 3  |
| Girtî .....              | 7  |
| Yılmaz Guney .....       | 8  |
| Name .....               | 10 |
| Zarokxana Kurda .....    | 12 |
| Proja Kurdi .....        | 14 |
| Agahdari .....           | 16 |
| Civin .....              | 18 |
| Birindar ê û Çavêş ..... | 19 |
| Rapora Xebatê .....      | 21 |

Berpirsiyar  
S. FERMAN

Pergala Rûpelan  
A. M. GILLY

Raxistina Nivîsaran  
RÛŞEN

Redaksiyon  
KEYXUSRO SÎPAN  
BENGİN BOTANI  
A. M. GILLY  
RÛŞEN FARQIN

**B E R B A N G**  
Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig  
utgivare och Redaktör:  
S. Ferman. Layout: A.M. Gilly.  
Sättning: Rûşen.

**A D R E S S**  
Kurdiska Riksförbundet,  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
TEL:08/984553

Prenumeratort: Medlemmar  
50.-kr/år Övriga 100.-kr/år.  
Postgiro: 64 38 80-8

## XWENDEVANÊN HÊJA!

Bî vê hejmara şeşem, Federasyona Komelên Kurdistan lî Swêd nêziki kongra xwe ya pêncem dibe. Beriya kongrê hejmareke di ya Berbangê dê der biçê.

Jî bo ku Berbang karibe jiyana xwe bîdomine alikariya we xwendevanan gelek pêwîste. Em hêvidarî ku hun abonetiya xwe jî mere bîşînin.

BERBANG

## BERBANG

Kovara Kurdi, Xwedi Federasyona Komelên Kurdistanê Lî Swêd.  
Buha: 5 Kron.  
Abona saleke: 50 Kron, 30 DM.

## NAVNÎŞAN

Berbang, Rissneleden 55. NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
Tel: 08/984553  
Postgiro: 64 38 80-8

şovenîstên tırkan  
ereba çawa dîbinin

Şinari Lamo

Ev ji çendakî virdaye ku li Tirkîyê li ser ereban munaqêşeyek mezin destpêkiriye û bi xurtayî dom dike. Mesela ku munaqêşe li ser tê kirin, gelekî muhîme, ji bo vê yekê ji çu ças kesên ku devên wan gotinê dike û destên wan pê nûsê digre, tevî vê munaqêşeyê (raberizan-

dinê) bûn û dîtînên xu yê n gelek 'hêja' pêşkêşî birûraya giştî kirin. Di vî warî de tu kovar, tu rojname ne man ku tevî vê munaqêşa 'muhîm'ne bin û di rûpelên xwena de cîh ne din dîtî nê n kesên ku li ser vê meselê diaxifin. Gelo, ereba çer kiribû

ku. hemû pîspor û aqilmendên dewletê û girre-girrên Kemalîstan li ser qiyamet rakirî bûn û ji bona êrîşê dor ne didan hev û du.

Mesele bi kurtayî eve: Hukûmeta Turgut Özal, bi pêşniyareke ve jî Meclîsê daxwaz kir, ku bira dersên zimanê erebî jî îro pêve di dibistanan de bê te xwendin. Bi vê daxwazê ve xwediyên pêşniyarê kevir û kûçik li xu barandin, sûcekî mezin

kirin. Çuça 'ronakbîr' û nivîskarên bi navê deng hebûn, piştî xwe dan hev û bi dengê hêlî gotin. Ji vê daxwazê mezintir li dinyayê tu sûc nabe. Ev daxwaz bi hawekî êşkere paşverûtiye, xerakirina medeniyetê ye. Tew hinek kes hîn jî pêş da çûn û go-

tin: "di dibistanan de daxwaza xwendina zimanê erebî bi gotî nek sivik, jahr belavkirina bi erebî ye", paş de birina Tirkiyê ye dîrxistina Tirkiyê ji şoreşên Kemalîzmê ye û.h.w. Emê nuha hin mînakên ji ber axaftinên

van ronakbirên Kemalîst bigrin. Lê berî viya bi kurtayî em dixwazin li ser çîroka vê bûyerê bisekinin.

Wek tê zanîn di dema Împaratoriya Osmanî dehim tedsîsat bi tîpên erebî dihat kirin û him jî erebî wek ziman di dibistanan de dihat xwendin. Lê piştî ku Kemal hukum girt destê xwe, di sala 1929 an de bi biryarekê ve xwendina zimanê erebî jî hate qedexekirin. Kesên Kemalîst,

ji vê yekê re dibêjin "şoreşa herfan" ji ber ku Kemal gelek şoreşên wisa çê kirine. Ji van şoreşên Kemal hinekên bi navê deng ev in: "şoreşa şewqa, şoreşa kinca, şoreşa zimên" û.h.w. Kemal bi van "şoreşên" xwe ve îddîa dikir ku wî, "milletê tirk ji cahiliyê, ne zaniyê û paşde mayîne xelas kiriye û welatekî gelek modern û Ewrûpayî ava kiriye." Bes bi vê jî ne maye, milletê tirk medenî kiriye û Tirkiyê jî bi van "şoreşên hêja" ve jî nav koma milletên paşde mayî û ne medenî derxistiyê, xistiyê nav koma milletên medenî, yanî Ewrûpayî. Ji wê rojê û virdeye ku hemû şovenîstên tirk, bi qîç û pîlên xwe ve wek ronîya çavên xwe li şoreşên Kemal xwedî derdikevin û sersuyê lê dikan. Û ji van şoreşan jî ya her ra mezin, bi navê deng "şoreşa" herfane, lewra jî divê baş bê parastin.

Ji ber ku "şoreşa herfan" şoreşek gelek muhîm bû, lewra jî hetanî îro tu kesekî bi xurtayî newêrî bû li dijî tiştê bigota û xwendina erebî di dibistanan de bîparasta. Ev yek bi vî hawî hetanî îro hat. Di heftên borî de hukûmeta Turgut Özal xwest, ku zimanê erebî jî di dibistanan de bide xwendin. Bê gûman bi vê yekê hin armancên dîktatoriya faşîst hebûn. Van armancan jî meriv dikare wisa rêz bike: Dilê hin şêxên ereban xweş bike û bi saya vê yekê jî, belkî karibe çend quruşan ji wan bijirîne; ya din, piştgirtiya kesên dîndar bigre û xwe wek partiyeke pîrr "musluman" nîşan bide. Munaqêşeyê li ser vê pêşniyarê destpê kir. Hemûyên Kemalîstan şûrê xwe kişandin û êrîş birin ser wezîrê xwediyê pêşniyarê. Hinekên jî piştgiriya vê pêşniyarê dikir û bi hawakî zindiqî digotin: "Erê raste, ketina zimanê erebî ya dibistana tiştê paşverûye, lê ji bona xapandina şêxên ereban jî divê ku hin kesên me yê n

bi erebî zanibin hebe." Emê nuha bi kurtayî hin dîtina bigrin destê xwe û li ser rawestin.

Kovara Nokta ji nivîskarê Kemalîst Oktay Akbal pirs dike: "Tu li hember pêşniyara ku bira zimanê erebî û farisî di dibistanan de bê te xwendin derketîbû û te gotibû ku, eviya daxwaza dîrxistina Tirkiyê ji şoreşên Kemale. Gelo tu îro çawa difikirî? Bersiv: Îro jî vê dîtîne di parêzim. Di ilmê heymanî-modern-çagdaş de ciyê erebî tune ye. Viya daxwaza çetandina Tirkiyê ji heymanê û nêzik bûna bir û baweriyên Rojhilatî ye" (Nokta.9-15/7.84). Yekî din, "Ji dibistanan dersên erebî kê m bûn dema ew jî têkevinê, wê meju bê ne şuştin û dibistanên ji bibin medrese (Mustafa Ekmekçi Cumhuriyet. 3.9.84). Dîtina yekî din, "Daxwaza hînkirina zimanê erebî, xebatên ew kesên ku dixwazin Tirkiyê paşde bibin. Dema erebî di civaka Osmanî de dihat xwendin, millet şelwar li xwe dikir. Ji ber ku çarmêrkî dihat rûniştin. Bi kincên xwe yê n nuha em nikarin çarmêrkî rûnên. Jiyana ku ev zimana bi xwe re bine, ji moderniyê gelekî dûr e. Li dijî şoreşên Atatürk e. (İsmet Zeki Eyuboglu Nokta. 9 15/7.84). Nuha meriv ji van gotinên şovenîst û pêlapuçî re çî bibêje û ji kuderê bigre destê xwe.

Oktay efendî dibêje di ilmê heymanî-modern de ciyê erebî tune ye, yanî meriv bi erebî nika re ilim fêr bibe. De tu were vê ecêba han, vê sosireta giran. Ma gelo erebî çiyê wî ji zimanên din kêmtir e? Ew tiştên bi elifbayê Latîni tî n nivîsandin, kare bi erebî jî bê nivîsandin û ji xwe tî n nivîsandin jî. Li gor vê dîtî nê, ew milletên ku elifbeya Latîni bikar naynin, wê nikaribin ji ilmê heymana me jî fê de bibînin. Lê li dinyayê gelek welat tîpên Latîni bikar naynin, wek

Japon, Çîn û Sovyet. Lê em bala xwe didine wan welatana him di ilim de him jî di teknîkê de jî Tirkiya Oktay, Mustafa efendi geleki pêşde ne, ya din erebî bi her hawî ji tirkî dewlemendtir e. Ji xwe dema meriv gotinên erebî ji tirkî derxîne, wê du kesên tirk nikaribin ji hev fam bikin. Û ji vê jî zêdetir, wê xwediyên van gotinên nikaribin nava jî li zarokên xwe kin. Mesele, navên xwediyên van gotinan bi xwe erebîne "İsmet Zeki Eyuboglu, Mustafa" Bê "oglu" yê n din giş bi erebîye. Ji viya de jî bikeve, ma ne bi xêra serê îslamiyeta erebaye, ku bî ci û war bûn, bûn bajarvanî. Gert tirkan Mihemed qebûl nekirina kî zane belkî hîn li serê çiyar koçer bûn û ji xwe re seydvani dikirin, yan jî bi kêmasî negihîştibûn vê medeniyata xwe ya nuha. Yanî ew erebên ku İsmet Zekiyê me pê qayil na be û wan bû çûk dibîne, bi xêra wan, mezinên İ. Ze kî bûn xwedî dewlet di dîrokê de Împaratorîyek mezin ava kirin û em jî bûn bindestiyên wan. Gelo di van bûyeran hemûyan de kî dikare rolê wekîltiya Mihemed biçûk bibîne? Lê cardin jî şêkir tune. Dibê beruyê ji qoziyê baz da, go, xwa!, min di wî devî kirê devekî mezin li ser e. Ya Mustafa û İsmet Zekî jî bû ev mesele.

Mistefa efendî dibêje ku, dema erebî têkeve dibistana wê "mejuyê zarokan bê şuştin û ji medeniyetê dûr kevin". Li gor vê dîtîne mîletê ereb tu carî nikare pêşde here û bibe "medenî Yanî ew kesên ku bi erebî dipeyivin, bes dikarin bibin xoce û mele. Jê wêdetir îmkan tune. Ji xwe viya jî diparêzin dibêjin, eger ku pêşniyara xwendina erebî ji hukûmetek Sosyalîst jê bê, -ku ez tiştekî wisa çet nikarim bifikirim, digot. Cardin jî kevneperestiyê (Melih Cevdet Anday) wê çaxê hemû mîletê ereb 'kevnepereste' ya xerabtir, vana hê bes bi erebî dipeyivin,

di ser de jî ereb in. wê demê 'kevneperestiya' wan jî dibe wek teniya zaxoyê, ne bi paçî kirin jê dihere û ne jî bi şuştin. Bê guman ev dîtîne çewte, ji ber ku bi xwendina erebî ne meriv dibe pêşverû û ne jî pašverû. Em nabêjin ku bira hutul- batil erebî têkeve dibistanan, lê çaxa têkeve jî dinya xerana be. Çawa ku bi xwendina İngilîzî û Fransîzî, Tirkiye pêş de ne çû û nare jî.

Ger wisa ba divê nuha Hindistan ji hemû welatan pêşdetir ba û li wir kes ji birçîna ne mira.

İsmet Zekî efendî dibêje, ku "dema erebî dihat xwendin, mîlet şelwer li xwe dikir... Em bi kincên xwe yê n nuha nikarin çarmêrkî rûnin, jiyana ku wê ziman bi xwe re bîne, ji medeniyetê gelekî dûr e, li dij şoreşa Ataturke." De tu were vî kerî di vî buhurî re derbas ke! Ji vî rebenê xwe dê wetnê ku ew, bi qerewata xwe û bi pantorê xwe bûye medenî. Lê nizane ku meriv bi kincan ne dibe medenî û ne jî ji medeniyetê derdikeve. Ma meriv çatek kinc li kerê ke, wê kerê bibe însan? na! bi kinc jî ker e û bê kinc jî ker e. Ya din jî, her kesên ku bi erebî dipeyive ma mecbûre ku fistan li xwe ke û çefiyê û egalê bide serê xwe. Wê çaxê hemû wela-

tên Ewrûpayê tije însanên bi çeffî û egal biba. Ji ber ku îro li hemû welatên Ewrûpa, zimanê erebî ne bes di unîversitan de, her wisa bi qursên taybetî ve jî tê xwandin. Ev yek him ji bo pêşda birin û hêsan kirina tica reta bi ereban re û him jî, ji bo naskirina kultura wan tê kirin.

Li gor van "ronakbîrên" Kemalîst ketina zimanê erebî ya dibistana pašverûtiye, paşda birina Tirkiyê ye û dîrxistina ji heymanê, ji demokrasîyê ye, û.h.w. Lê ev çar sal in ku pênc leşkerên faşîst tiştên ne mayî

aniye serê gelê Kurd û Tirk, Tirkiyê pê bi paşda ne çûye û ne pašverûtiye, hemû mafên însanî û demokratîk ji navê hatiye rakirin, ne kevneperestiyê, bi hezaran ve însan tije zindanan bûne, zarokên 17 salî hatin kişandin ser darên sêpiya, ne kevneperestiyê, pîrekên memûr, mamoste wê kîjan solê, kîjan gorê, kîjan fistanî li xwe kin, çuqas bîn û boyaxê di xwe bidin û çuqas zêr karibin bi xweve kin; peya jî bi vî lewnî wê por û simêla xwe (rî berdan yasax Riya hemû xoce û Profesoran jî hate kurkirin, yê n riya xwe kur ne kir, ji karhatin avêtin) çawa kur bikin, kîjan kincan li xwe kin û kîjan gustilê karibin têxin tiliya xwe, vana giş bi qanûn, yek bi yek hatin rêz kirin ku wê çawa bibe; vana hemû ne kevneperestiyê, Tirkiyê ji hemanê bi dîrnaxe, lê xwendina erebî di dibistanan de kevneperestiyê û wê Tirkiyê ji heymanê dîrnaxe bixe. Meriv dikare van mînakên hîn jî pîr bike lê em bawerin ku ne hewce ye.

Pîştî van mînakên jorîn, nexwaze mirov vê pîrsê ji xwe dike: Ma gelo van kesana çîma gelê ereb wisa biçûk dibînin û hewqas tiştên berradayî dibêjin.

Em bibêjin, ji ber ku şovenîstîna loma. Wek tê zanîn şovenîzm bi kurtayî, hêjayî û mezinatiya milletekî, di ser milletekî din re qebûl dike. Ger em bi hawakî din bibêjin, li gor şovenîstîna milletek gelek hêjaye, mezin e û milletekî din jî, ne hêjaye, biçûke, nezan e û.h.w. Tiştekî dinî gelek muhîm jî, ku divê em tu carî ji bîr nekin; şovenîzm, di bin kirdariyê faşîst de hîn xurttir dibe. Ji ber ku hêzên faşîst şovenîzmê her roj pîj dikin. Ev yek jî li Tirkiyê, ev serê çar salan e ku ji alî dîktatorîya faşîst ve bê nabên tê kirin. Ji xwe berê gelê ereb biçûk dihat dîtîne, lê di nav van çar salên borî de ev yek hîn jî pêşda çû. Vê

yekê meriv dikare di warê turîzmê de gelek baş bibîne. Nuha jî em dixwazin çend mînakên ji vir bigrin.

Di van salê dawî de ji gelek welatên ereban turîst tîn Tirkîyê. Li gor îstatîstîkên dewletê di sala 1983'an de ew turîstên ku hatibûn Tirkîyê, ji her çarê wan, yek î ereb bû. Û tê texmîn kirin ku wê ev hêjmar di 1984'a de bi kêmasî %30 zêdetir bibe. Piraniya turîstên ereban, halên wan xweşe û lewra jî gelek pere xerc dikin. Bi vê yekê her çiqas kara wan digêhê Tirkîyê jî, lê cardin biçûk tîn dîtin, wek turîstên Ewrûpayî qedr û rûmetê na bînin û hertîm tîn xapandin. Mesela em bala xwe bidin gotinên dikandarî, ka gelo ji bo turîstên ereb çî dibêje. Jê tê pirs kirin. "ma gelo her demên salê tu dikarî ereban bibîni?"

Bersîv "Hûn çet meraq ne kin, ez her demên salê dikarim erebekî ku bipûrtîkînim (birûçîkîmim) bibînim" ..

Ger tiştek ji bona turîstên din bi hezarî be, ji bo ereban bi deh hezara ye. Dema bazariyê jî dikin, bi wan dixeyîdin û awirê tal didin wan. Îcar dema bazariyê nekin, wan 'nezan' û 'ehmeq' dihesibînin.

Rojnamevan ji mudurê Ararat turîzmê pirs dike, dibêje ku, ma gelo xwedîyên otêlan ji ereban razî ne?

Bersîv: "meriv nikare bibêje ku jê razîne. Ereban demê dirêj dimînin û divê demê de jî oda xwe gellekî qilêr dikin. Di odê de qahwê, şivê çê dikin û ji sibê hetanî êvarî di hundur de rûdînin. Lewra jî otêl xera dibe, pîs dibe" Yanî meriv ji gotinên midur efendî bawer bike, turîstên ereban cara ji hundur odê dernakevin, wek hefsiyên wer di hundur de ne. Ê çey ji bona ku di hundur de rûnî tîn Tirkîyê. Rojnamevan dibêje ku, 'gelo tu-

rîstên ereb ji personalên otêlan razîne?'

Bersîv: "Personalên otêlan li hember turîstên Ewrûpayî hîn nazik in. Yekcarna bi turîstê ereb de dixeyîdin (Nokta 5.8.84) Karkêrekî resepsiyonê jî wusa dibêje "pirr dikin çere-pere. Meriv nikare bêje, ku li paqîjiya xwe jî miqatene. Zebeşe xwe penêrê xwe, nanê xwe digrin destê xwe û tîn di odê de perçe dikin û duxun û li vî alî, wî alî pîstîyê belav dikin. Xwarinên bi rûn bi destê xwe ve dixwin û di dûre jî hema bi wî hawayî di wê odê de radikevin. (Nokta 5.8.84). Van gotinên jorîn, yê karkêrekî otêle ye. Lê belê dîtinên berpirsiyarekî dewletê (berpirsiyarekî kultur û turîzmê) ji yê vî karkêrê otêlê gelekî xiraptir e. Em nuha çend rêza ji gotinên wî bigrin ku karibin bi çavên serê xwe bibînin, ku berpirsiyarekî hukûmeta T. Ozal, di derheqê erabande çawa difikire. Bi van gotinên jêrîn meriv dikare dirûfîya hukûmeta Ozal jî baş bibîne. Wek me li jor jî mînak dabû ku, hukûmet, dixwaze zimanê erebî têkeve dibistanan. Ji alîkî de vê pêşniyarê tînin û ji aliyê din de jî gelê ereb, ne medenî ne zenan û bi biçûk dibînin. Ev jî du rûtiyek faşizmê ye

"Turîstên ereban bêî perên wan, tu fêda wan tune ye, di ser de jî zerara wan heye. Ji xwe di warê kulturî de tiştekî naynin, lê zirarê didin. Ma gelo kesên ku li Beyoglu yê bi kum digerin, merivê karibe wekî din bi çî hawî îzah bike? Ewrûpayîyên ku wan bi wê halî bibînin, ma wî ne bêjin ku Tirkîyê welatekî ku hîn însan lê bî kum (fes), pîrek jî bi çarçefên ku tîrêjên royê di be re nare ye, bêî vê jî, ji xwe narin plaja û di ser de jî heta tu bixwaze 'pinû'ne. (yanî gelekî pîs, qilêrî gemarî) Ev berpirsiyarekî hukûmetê van gotinên xwe yê rezîl di mala xwe de nabêje, di kovarek ku bi hezaran ve çap

dibe de dibêje. Ev berpirsiyar turîstên ereb ji ber kincên wan, wan biçûk dibîne û medenî hesap nake. Lê belê turîstekî Ewrûpayî eger ku şirrika jî bi xwe ve ke û xwe şût û tazî jî bike, yan jî cileke keran jî li xwe ke, ew cardin jî medenî ne û tiştên ew dikin jî hemû kulture. Bi rastî jî ev tiştekî gelek ecêb e. Hemû şovenîstên tirkan, qasî ku gelê ereb biçûk dibînin hewqasî jî Ewrûpayîyan mezin û di ser xwe re dibînin. Lewra jî Ewrûpayî çer bikin, çî li xwe kin, ew hemû kultur e û divê meriv jî wek wan bike.

Tişkî din jî, ger em medenî bûyîne bi kincan ve girêdin, divê em bibêjin xwedîyên van gotinan jî ji medenîyê gelekî dûrin. Ji ber ku şelwarê dîya Îsmet Zekî Efendî ji fistanê ereban dirêjtir e, û li Ewrûpayê jî gelek bi nav û denge. Lê belê em wisa nafikirin, dîtinê wisa jî çewt e.

Em bibêjin ku yekî ereb texstîyek wî hebe, wê bibêjin "law hela tu li vî erebê han mêzeke çî texsî dibîni de ye?", bi Îngilîzî bi peyve, wê bibêjin (law hela tu li vî erebê han mêzeke, bi Îngilîzî dipeyîve). Em zêde dirêj nekin, li gor şovenîstên tirkan tu tiştek ne layiqê ereba ye, divê ew herin ji xwe re "selwanîya devan" bikin "Û ji bona ku karibin bêî Tirkîyê, divê şewqê lengerî "ji ber ku pêşîyên wan tim bi şewqê lengerî bûn!" bidin serê xwe. Lê cardin jî dibêjin "ku "Hêvîya me ereb in" ji ber ku turîstên "xwedî kultur", yanî Ewrûpayî pirr kê mî diçin merkeza "medenîyê" û kultûrê.

# GIRTÎ

## *Firat Cewerî*

Ev tam meheke wî çêbûbû ku girtî û di nezaretxanê de bû. Ji lêdan û îşkencê mirov ew nas nedikir. Porê û riha wî ya xelekî ser ruyê wî yê zeyîf winda kiribû. Ji xwe mirov digot qey devê wî tuneye. Simbêlê wî ser herdû lêvên wî girtîbû û daketîbû heya bi ser çenga wî. Ji por û riha wî, serê wî ji laşê mezintir xuyadikir. Bi wî awayî destên xwe bi hêz li deriyê hesinî xist, da ku henek jê re derî vekin û here tualetê (Avrêje, daşirê). Wî du sê caran welê li ser hev li derî xist lê, tu kes pê ve nehatin. Dû re destên xwe avêt ji şîşên derî de, pê girt, bi hemî hêza xwe hejand û bang kir. Bi dengê wî re herdu polîsan li çavên hevdu nihêrîn. Yekî ji wan araqîya ku di şûşê de mabû bi ser xwe dakir û rabû ser xwe. Lê rabûn û ketina wî bû yek. Hevalê wî rabû ku wî ji erdê rabike. Ew ji wilo dihejiya, ku mirov digot, a wextî bê xwarê. Lê wî xwe girt û neket. Daqûl bû, bi herdû milên polîsê ku ketîbû girt, hejand û bi dengê ne zelal (dengên serxweşan) got.

- Tu rabe here xwe li ser qoltixan dirêj bike!

Polîsê ku li erdê weke ku vereşê qirpika wî hilat. Bi piştê destê xwe simbêlê xwe paqjikir û wî jî bi dengê serxweşan got

- Te got çi...? Ma ji te tirê ku ez serxweş im? Ez ne serxweşim haa.

--Erê erê, tu ne serxweş î, lê tu rabe here xwe biskê li ser qoltixan dirêj bike.

Dû re hejîya û wextî biketa, lê neket û bi hêrs ji polîsê ku ketîbû xwarê re got

--De rabe ha! Lawo tobe be, ku ez careke din bi te re araqîyê ve-

xwim!

Polîsê li erdê weke gayan kir Urînî:

--Ji te weye ku ez serxweşim ha! û bi hêz ji erdê rabû. Gava ku rabû, çokên wî hejîyan û wextî dîsan biketa. Lê yê din kete bin milê wî, ew bire tualetê, serê wî da ber ava cemidî û şuşt. Piştî ku serê xwe dawşand, got:

-Yaho bi rastî jî vê mîrata araqîyê tesîr li min kir, Min digot, qey ez tu caran nakevim.

Yê girtî ji serî heta binî li wan guhdarî dikir. Dîsa li derî xist û got:

--Derî vekin, derî vekin ez herim tualetê! Min bi xwe de mîst!

Gava ku polîsan dengê wî kirin, yekî ji wan jî dê û jina wî re xeber da. Lê deng neçû girtî ji ber ku deng hebekî ji dûr ve dihat. Yê girtî beyî ku navbirê bidîyê her li derî xist. Yek ji nav wan polîsan di tualetê de vereşîya. Piştî ku dev mevê xwe şuşt, çû û xwe li ser qoltixan dirêj kir. Yê din jî rahişte meqesê û ber bi nezaretê ve çû, da ku ji xwe re biskê bi yê girtî bileyîze û por û riha wî bide ber meqesan. Gava ku deriyê nezaretê vekir, gêj bû, şewişî, ket û dîsa rabû. Hema ku rabû ser xwe meqes avêt ji porê girtî de. Du-sê caran wele meqes avêt ji por û riha wî de û her carê gulokek ji serî tanî xwarê. Lê çaxa girtî tê derxist, ku ew bêhêz e, heta ku jê hat hutikek di nava serê wî de lê xist. Bi hutika girtî re, polîs hejîya, çavên wî çûn û hatin li ser

piştê li erdê ket. Pê şî hebekî girtî tirsîya, dû re hêdî serê xwe derxist û li hundir polisxanê nihêrî. Piştî ku li hundir polisxanê mêze kir, li hundir vegerîya qedere deqîqekê fikirî û rê ji hev du derxistin. Paşê zû zû Daqûl bû ser polîs û kincên wî jê kirin. Pê-şî çakê t, dû re şalwar û dawîyê jî solên wî ji lingan kirin. Şewqa wî ji xwe berê ji serî de ketîbû. Hema zû zû jibo ku wext winda neke kincên xwe ji xwe kir û ew kincên ku ji polîs kirîbûn li xwe kir. Piştî ku kincên polîs li xwe kir, di dilê xwe de got "Xwezî ku niha neynikek li vir hebûya û min li xwe binihêrîya". Dû re şewqa polîs ji da serê xwe. Mirov digot qey ew çek xisûsî ji bo wî hatibûne çêkirin, tam li gorî wî bûn. Lê ji ber ku ji lêdan, îşkencan û birçîbûna zeyîf bibû, ew çek hebekî jê re fireh dihat. Dû re bi herdû destên polîs re girt û weke ku mirov belatekê bikşîne, ew kişande quncika nezaretê. Guhê xwe da ser dilê wî û li lêdana dilê wî guhdarî kir, dilê wî hin jî lêdixist.

Bi yek derbê ramanek hate girtî. Hema ji nişkê ve rahişte wê meqesa li erdê, bi riha xwe ket û qesand. Meqes tûj weke jilê t bû. Di hindirê niv deqîqê de ji bilî simbêlê wî pirç li ser ruyê wî nema Dû re hêdî deriyê nezaretê liser wî girt û derket. Ji dengê qîrîna polîsê ku ler qoltixê raza yîbû pê ve, tu deng ji hundirê polisxanê nedihat. Girtî hêdî di ber wî re derbas bû, û derket ji der ve. Tevlî tarîtiya şevê bû û bi gavên xurt lezand.

# çend qunaxên giring di Jiyana yılmaz guney de

1937. Yılmaz Guney li Edenê (Adana) tê dinê. Diya wi piştî şerê yekem ê cihanê ji Muşê tê Edenê. Bavê wi ji kurd e, ji sedema hevkuştinê Siverekê terk dîke di zarokatiya xwe de li Edenê ciwar dibe.

Ta 14-15 saliya xwe Yılmaz Guney, bî gelek karên cihê-cihê radibe, pembû dîçine, di selexanê de dixebite û hwd. Û ji aliki ve ji, diçe xwendinê.

1952: Kîtêba BİRGÜN (rojek) dinivise, şerê gundiyan tîne zîman.

1952-54: Peywendiyên wi bî sosyalista re pêk tê û ditmeke siyasi pê re eşkere dibe.

1955: Destpêdîke hê eşkeretir dinivise. Heft sal û niv cezayê girtimayinê û du sal ji sîrgûn jê re tê xwestin. Paşê ev ceza bî sedema 'propagandayê komunistî' weke sal û hiv girtimayin û şeş meh sîrgun tê guhertin. Sedema wê ji kîtêba wi ya 'ROJEK DÊ DAWIYA TE JI

BE' ye. Kuştina axayek bî destê gundiki dibe babetê kîtêbê.

1958: Dî filma Atif Yılmaz 'Ala Geyik' de dilize.

1959: Mehkema Guney dawî dibe û jê re ceza tê girêdan. Guney direve, lê ji aliki ve ji xwendina xwe di fakulta ekonomiyê li Îstanbulê didomine. Lê firari û paşê girtina wi, mecal nade ku xwendina xwe dawî bine.

1961: Piştî mehkema xwe ya 1955'a 18 meh girti dimine. Li wê derê kîtêba xwe ya 'BOYNU BÜKÜK ÖLDÜLER' (Ew stûxwari mîrî) dinivise.

1963: Bajar-bajar digere ku peyman ji bo filmên xwe bî şirketan re çêke. Filma wi ya 'SENİ KANUN ADINA' (Te bî navê qanûnê) dibe gava yekem ku wi derbasê sûka filma dîke.

1968: Patronê şirketê li serpehatiyên Guney agahdar dibe û dibêje 'cihê komunistek li bamin nine'.

Bî filma SEYİTXAN gaveke ge-

lek hêja di warê filmçêkirinê de dayêje. Dî vê filmê de pirsên civaki ya kurda tîne zîman.


1972: Yılmaz Guney bî anarşistî tê itham kirin û tê girtin. Dî girtigeha Selimiye ya leşkerî de kîtêbên 'SELİMİYE ÜÇLE-Sİ' (Sêberiya Selimiyê) HÜCREM (Hucra Mî) û SALPA SAPIK, SELİMİYE MEKTUPLARI (Nameyên Selimiyê) dinivise.

1974: Bî sedema provakasyonêk tê girtin; Dî aşxaneke de hakîmek diqire 'Ew komunist ku jina wi xwe firoş e' Guney û jina xwe di aşxanê de rûniştine. Hakîm tê kuştin. Û kuştina wi dixin stûyê Yılmaz Guney û 19 sal ceza didin Guney.

Dî girtigehê de filmên xwe yê bî nav û deng SÜRÜ: DÜŞMAN û YOL û kîtêba OĞLUMA HİKAYELER (Çirokan ji zarokên min re) dinivise.

Bî sedema kîtêba 'Faşizm' heft sal û niv, ji bo kîtêba 'GRUBÊN POLİTİK' heft sal û





niv, ceza didinê. Her usa ji bo nama wi ya ji serokê festivala Valladolik a Spani, Fernando Herre re ji 5 salê di ceza didinê. Bî hevre cezayên wi ji sedî derbas dibe.

Filmên wi SÜRÜ, DÜŞMAN, ARKADAŞ lî Turkiyê tîn qe-dexe kîrîn.

Dî dema cûnta faşîst a 1980 yan

de Güney, bî izin ji girtigehê derdikeve û Turkiyê terk dike. Dî demên dawî de ew lî girtigehê filma xwe ya navdar "YOL" (Rê) dinivise, û tê Fransayê rengeki nû dîde filma xwe. Ev film dî festivala Cannesê de dibê hêjayê filma yekem. Bî filmê re Güney pîrsa kurda bî awakî netewî-civakî lî herderên cihanê lî perdên spi radixe.

Jî cotmeha 1982 a ta Avrîl'a 1983, lî Fransa filma xwe ya DUVAR (Diwar) çê dike, rewşa girtigehên zarok û politik tîne zîman.

9 ÎLON 1984: Yılmaz Güney bî nexweşîya kanserê çavên xwe lî dinyayê dîgire. Ev insanê jir, navdar, hêja dî wextê xwe yê herî hêjatr de diçe heqîya xwe.

# NAME JI DÎYA MÎN RE

Dayê! Min îşev xewnek pîs  
Xewnek nexweş dît  
Di xew de,  
Xewnek giran.  
Bavê min ê kal  
Dilê wî disekinî  
Dîsa li ber xwe dida wek berê,  
Dîa dîkir

Ji Şêx Seyda  
Ji xwedê  
Lê dian pere nedikir  
Hun hûr û gir  
Li ser wî kom bûbûn,  
Min derbkê dît  
Çavên wî vebûn

Ji deva çû xûn  
Û hun  
Bi derbkê re qerîyan  
Dengê we çû asûman  
Te got : Em bê sermîyan  
Zarokên min sê wî man  
Hingî ji xew hol bûm

Şil bibûm ji xwê danê.  
Hêsir diherikîni,  
Bûbûm wek avê  
Kil dibûm wek hêlkanê.

Ku min dît xewn e  
Min got : Şikir  
Min kêf kir anê!  
Ji alîyekî de

Min dît bi tenê me  
Bi tenê, bi tenê..  
Ne li ba we  
Dûrî we me.  
Min li saetê nihêrî  
Bist û pênc derbas dibû ji sisyan.  
Min çavên xwe paqij kir  
Li min hişk bû ew xwedan  
Dû re rabûm ser piyan.  
Min cigarek vexist û kişand,  
Di du hulman de  
Min cigare kir xwelî  
Di xwelîdankê de çikand.  
Paşê çû me daşirê  
Min avek rijand  
Vir de, wê de  
saet bû çar  
Min çayek çêkir û vexwar,  
Ev name,  
Min hingî nivisand  
Bi çavên hêsir  
Bi vî dilê jar.

Dayê!  
Ma min çi kiribû lê?  
Min li talanên kê xistibû?  
Min malê kê xwaribû?  
Min girtibû ser gundên kê?  
Min zarokên kê tirsandibû?  
Min mala kê wêran kiribû?  
Min kî kuştibû lê?  
Lê ji bo çi,  
Ji bo çi ev xwînîbûn?

Dayê!  
Ev çend sal  
Çend cejn û dîlan  
Çend havîn û zivistan  
Û çend demsal in  
Ku min hun nedîtine.  
Ji xwe nayê hêjmartin roj  
Lê ez her roj  
Li we difikirim  
Li te,  
Li kalê bavê xwe.  
Li birayên xwe,  
Li hevreyên xwe  
Li welatê xwe difikirim

Lê dayê!  
Ew pirtûkên di hewşê de,  
Yên ku di bin erdê de  
Gelo ew li wê ne hê?

Ew pirtûkên xweşik  
Yên mezin  
Yên biçûk  
Yên sor  
Yên gewr  
Yên reşik  
Ji kerema xwe re dayê,  
Wan biparêze  
Wan hilîne li wê.


Ger gengaz hebe  
Bide birayê min  
Bila bixwîn,  
Da xwe biparêzin ji dijmin  
Ya çenc ew e  
Dayê,  
Dayika min!

Lê ew helbestên min?  
Yên ku di paşila te de hertim?  
Gava leşker dihatin  
Te tim ji min distandin  
Yên ku te di paşila xwe de dihilandin  
Ger tu karibî  
Bide kekê min Emîn  
Bila bo we bixwîn  
Nemaze bo bavê min  
Erê dayê!  
Dayika min!

Lê ew alfaba si û yek tip  
Te dît min çawan dinivîsî?  
Berê A  
Dû re Z û A  
Dû re ji D û Î  
Dibû A-ZA-DÎ  
Ser zilma axan  
Ser çivên rovi  
Te di,  
Te dît min çawa dinivîsî?  
Ger tu karibî  
Wê biparêze  
Lê bibe xwedî.

Dayika min!  
Rohniya çavên min!  
Min bihis ku tu digirî  
Tu digirî ji bo min  
Gava dibihizim  
Agir dikeve dilê min  
Çi dibe megri,  
Megri ji bo min!

Ez çi bikim  
Ez zanim  
Jina bavê min  
Dayika min,  
Dayê!  
Bê min sebra we.  
Bê we sebra min nayê.



**dr. POLOÇO**

# ZAROKXANEK

Lı navça Tensta Stockholm, zarokxana kurdan vebû û ket xebatê. Rojnama rojin 'Dagens Nyheter' dı pêhatiya xwe ya 'Runt Stan' ev bûyera dı rûpelên navin de weşand.Em ji vê nivisê bı kurtayi dıweşinin:

Lı vir 15 zarokên navbera 1,5 û şeş sali (5 kur, 10 keç) henin. Dê û bavên wan multeciyên siyasi ne. Lı welatê wan zımanê


kurdi tê rawestan,zordesti lı ser kurdan tê ajotin .

Lê nuha lı navçeyeke Stockholmê ev zaro ji xwe re ciki ditin, dê û bavên wan kêfxweş in. Dı vê zarokxanê de weke zarokxanên din ji bo zarokan materyalên listikê û hwd henin. Du xebatkarê wê swêdi, dudo yênin din kurd in.

Berpırsiyarê zarokxanê Birgitta

Hedman dıbêje: Em dixwazın zımanê wan ê dê ji nû ve diyariya wan bıkm, pıraniya wan bı tırki dixafın.Em dixwazın,kurdi û Swêdi têkın ciyê zımanê tırki. Swêdi fêr dıbmın jı bo ku karıbmın dı cıvata Swêd de pêşkevın. Jı bo vê yekê hemû listık çırok, stran bı kurdi û swêdi ne.

Dı payizê de mamosteyêke kurd ji bo 30 saet dê bê ditin.



## Här tillb

Utifrån ser det út sorhelst där det ligger inspr. Men faktum är att i hitills enda kurdiska da

Här finns 15 barn i åldrarna 1,5-6 år, fem pojkar och tio flickor. De är barn till kurdiska föräldrar som av politiska skäl tvingats lämna Turkiet, där vägen de eller deras barn tillägnade eller läsa på sitt språk. A utveckla den kurdiska kulturen, språket, identiteten, är i Turkiet straffbart och den kurdiska befolkningen förföljs av myndigheterna.

Men nu har alltså världens största flyktingbyråer fått ett eget daghem där deras barn kan äta, vinna det som berövats dem. För åldrarna är mycket lyckliga.

